Jîn

Jimara 13 Heyva Êyarê 2007 Vercinye, Emrîke

Miruv ji gîanewera feriq e; feriqê hey bi axiftinê. Miruv peyva bi kar diînin da biaxivin li gel êk u dû.

Ji demê Ademî u Ḧewaê ḧeta demê pêẍember Nuḧî miruva bes *êk* ziman diaxift. Belê nuke pitir ji 6000 ziman li dinyayê hey.

Paşî reşe avê (feyezan) hebî - ewê mezin ku ḧemî ‘edir ji bilî mala Nuḧî u xêzana wî u hindek ji gîanewera xirab kir.

Piştî hingê her sê kurrêt Nuḧî u jinêt wan biçîk u nevî hebîn - ḧeta carek dî tijî miruv hebîn – tijî millet li dinyayê. Belê Neynewa (bajêrrê Mîsil) ji destê Nemrudî (kurrê Kuşî, kurrê Ḧamî, kurrê Nuḧî) ava kirî.

Li wê demê Xwidê *tijî* ziman çêkirin çunku miruv xelkê ta’eta Xwidê ne dikir. Piştî reşe avê, Xwidê gut Nuḧî u kurrêt wî, “Berî bidin u zêde bin u erdî tijî bikin.” Kurrêt Nuḧî pîa wî kir (berî dan u zêde bîn), belê pîa wî ne kir çunku erdî tijî ne kir. Belê, ḧemî miruv maîn li êk cihê u Xwidê ne razî bî.

Ev mêjue çêkirna zimana ji destê Xwidê ye. Eve ji pirtuka pişka 10ê li “Destpêkirin”ê u ji destê pêẍember Musaî nivîsî:

Kelha “Babil”



Xelkê erdî hemîya bi êk zimanî diaxiftin. Demê barkirîn bu rexê rojhelatê deştek li erdê Şîn’arî dîtin u li wêrê akincî bîn. Îna hindeka gute hindeka, “Werin da em baştirîn li binêt baş qelandî çêkîn.” Bera bi li binêt qelandî biguhurrîn u qor bi zeftê u paşî gutin, “Werin da em bu xu bajêrrekî u kelhekê ava bikîn serê wê bigehîtin esmana, u dê navekê bu heta hetayê bu xu deynî, da em li ser hemî rîê erdî pelate u mişext ne bîn.”

U Xwidê hate xwarê daku ewî bajêrr u kelha miruva dest bi ava kirna wî kirî bibînit. U Xwidê gut, “Heker êk millet bin u bi êk zimanî biaxivin, hêş ji destpêkê ev tişte kirin. Vêca çi tiştê wan bivêt bikin li def wan zeḧmet nabit. Werin da em biçîn xwarê u ezmanê wan pelatekîn daku kes di ezmanê kesê negehit.”

U husa Xudanî li ser rîê erdî hemîê pelate u mişext kirin u dest ji avakirna bajêrrî ber da. Ji ber hindê navê wî bajêrrî kirin “Babil” çunku Xwidê ezmanê hemî xelkî erdî têkşeland u paşî her ji wêrê li ser rîê erdî hemîê pelate u mişext kirin.

Paşî Xwidê gut Musaî (u Musaî gut xelkê), “Bi neḧeqî bi navê Xudanî – Xudayê xu – ne axive, çunku Xudan wî kesî siza didit yê bi neḧeqî bi navê wî biaxivit.”

Wextê pêẍember ‘Îsa li ser erdî bî, wî gut xelkê, “Qet sînd ne xwin: ne bi esmanî, çunku ew textê Xwidê ye, u ne bi erdî, çunku ew cihê pêt wî ye, u ne bi Urşelîmê, çunku ew bajêrrê paşayê mezin e, u ne bi serê xu jî, çunku tu ne şêî mîekê bi tinê jê spî yan reş bikî. Bila axiftina we, “belê” “belê” bit u “nexêr” “nexêr” bit, u ji vê pêvetir ji xirabîê ye.”

Gelek miruv li dinyayê me bi neḧeqî bi navê Xwidê bi kar diînin. Her dem wesa dibêjin: “Ya Xwidê!” u “Bi Xwidê!” – u rast e yarmetîê Xwidê ya cidî naxwazin. Çunku tijî husa diaxivin, em bawer dikîn “çi nîne, ez jî dê husa bêjim.” Belê çi *heye*. Gelek qedirê Xwidê nagirin u pîa wî nakin.

Bila em kirîna ta’eta Xwidê bikîn u zimanê me bi qedirê wî bêjîn.

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.